

FETHA MİSİLMANAN A CEZİRABOTAN

Prof.Dr. Mehmet AKBAŞ

Zanîngeha Gaziantep/Turkiya

Puxte

Piştî ku Péxemberé Xuda ji jiyan dest da Xelife yé yekemîn Ebu Bekir dest bi fethén İslâmî kir. Du ceyş amade kir u şand du aliya. Ji wana yek şand Bîlad a Şamé u é di jî şand Iraqé. Wexta ku çeyşen Misilmanan Şam fetih kîrin bala xwe dan Cezîraban. Piştî Ebu Bekir ji jîyan xwe dest da Omer kuré Xetab bu xelife. Wî jî fethén İslâmî domand u gelek deru dorén mezin ji alî yé misilman ve hate fetihkirin. Xelife Omer ïyaz kuré Xenm bo fetha Cezîraban kir serokceyş u ïyaz bi pénç hezar nefer beréxwe da Cezîraban. Wé deméCezîraban dîbin hakîmiyeta Bîzansiyen de bu. Piştî ku misilmanan fetha Şamé bi dawi kîrin balaxwe dan liser én ku alîkarî ji Bîzansiyen re kîrin. Xelké Cezîraban bi bîst hezar nefer derket li hember Misilmanan. Li Cezîraban gelek şerén girîng cébun. Li Cezîraban cî yé ku é herî pésta hatîye fetihkirin Ruha bu. Piştî Ruha yé Amed, Nisébîn, Mardin u Sérd u derdora wî hate fetihkirin. ïyaz kasî saleké li Cezîraban ma. Di saleké da herderé Cezîraban kete bin hakîmiyeta Misilmanan. Piştifethé gelek sahabîyan hatin bajarén Cezîraban u li wéderé bi cîh bun. Di vé lékolîné de diroka fetha İslâmî yaCezîraban wé were behskirin.

Peyvîn Serekî: *Cezîraban, Fetih, İslâm, ïyaz, Ruha.*

İyaz kuré Xenm u Fetha Cezîré

Cezîre, Diyaramudar, Diyararebia u Diyarabekirve sé perçen e. Bajarén Diyaramudar, Ruha(Şanlırufa), Herran, Reqqe, Samsat u Serékaniyé ye. Bajarén Diyararebia, Cizre, Hezex, Nisébîn, Dara, Musil u şengal e.⁽¹⁾ Li Diyarabekir, Amed(Diyarbakır), Mérdin, Ferxîn (Silvan) u Hesenkéf he bu.⁽²⁾ Ferat u Dîcle, nehrén ku sinora Ceziré teyin kiri bu, ji erdén Rumé derdiketin u he ya korfeza Besrayé diçun. Li gora gotinén Yaqut ev der bi bereket u xweşî u pîrbuna nîmetan meşhur bu. Bajar u kela u surén wî gelek bun. Li ser bajarén wi yé meşhur gelek kitéb hatîbun nîvisandin.⁽³⁾ Wexta MisilmananCezîraban fetihkirin ev der bi Qînnesrîne ve girédan.⁽⁴⁾ Di dema fethén İslâmî destpêkir împaratora Bîzansiyen Herakleios li Ruhayé rudinişt. Ruha di vé demé de bajarekî gelek giring a Cezîré bu. Mintiga Cezîré ji alî nîfusé de geleki qelebelix bu împarator di wexté herban de ji xelké vé deré alîkarî dixwast.⁽⁵⁾ Ev der dibu meydanén herbé ku di navbera Sasanî u Bîzansiyen de derdiket. Di sala hîcrî a 6an de herba ku di navebera Sasanî u Bîzansiyen de derketî bu Sasaniyan serkeftîbun. Ev herba di Qurana Piroz'de derbas dibe.⁽⁶⁾ Misilmanan xwastîbun ku Bîzansiyen bi serkevin.

Îyaz kuré Xenm

Navé wî, îyaz kuré Xenm kuré Zuheyr kuré Ebu Şeddad kuré Rebâa kuré Hîlal kuré Malîk kuré Zabbe kuré Harîs kuré Fîhr kuré Malîk e. Kunye ya wî Ebu Sa'd u Ebu Saîd e. Qebîla wî ji mala Fîhr e u ew jî çeteka Qureyş e.⁽⁷⁾

Îyaz berî silha Hudeybîyé buye Misilman.⁽⁸⁾ Îstîrake herbén piştî silha Hudeybîyé pék hatîye kirîye. Îyaz din nav Misilmanan de bi qumandanî u bi herban meşhur buye. Di serdema xelife Ebu Bekir u Omer da navé wî hatîye bîhîstin. Teve geleki cengan buye u din nav sahabîyan de bi vî halî hatîye naskirin.

Wexta çeyisé Misilmanan hatin Şamé îyaz pé re hatîye vé deré u teve herba Yermuké buye. Li Cezîraban, li Qinnesrînê u Himsé qumandanî u walîtî kirîye. Wexta ku Ebu Ubeyde ew qumandan teyînkar, bi xelife Omer ra neşewîrî u Omer jî wexta ev bîhîst got ku: Yek î ku Ebu Ubeyd teyînkiriye ez tedé nadim.⁽⁹⁾ Omer, ji îyaz re xeber şandîye ku "Ez te teyîn dikim ser wezîfa ku Ebu Ubeyde te teyîn kiriye. Piştî vé teyînê Misilmanekî ew şikat kir. Wanî digot: Ey Omer tu çawa yekî ku israfkare didî seré Misilmanan. Ew di dest xwe da ci he ye u ci tu ne ye belav dike. Ki ci bixwaze didéké. Li şuna wî te Xalîd kuré Welîd teyînkira. Lé bele Omer ew di şuna xwe da hişt u tedé ne da. Îyaz qumandaniye xwe domand.⁽¹⁰⁾ Îyaz ew wezîfa kasî di sala domand. Di sala 20an (mîladî 640) de li Himsé wefatkir. Wexta wefata xwe da şest salî bu u wé demé ne deyné kes î lé he bu u ne jî deyné wî li kesî he bu.⁽¹¹⁾ Îyaz li gora peyva Îbn Asakîr ji pêxember Muhammed (s.) du hedîs ragihandiye.⁽¹²⁾ Yek ji wan der heqé eziyetnekiriné li însanan e u yek jî der heqé nesîhetkirina bo însanan bi dizî da ye.⁽¹³⁾

Îyaz wezîfa komkirina xeracé jî kirî ye. Li Şamé bu ye kâtibé Xelife Omer e.⁽¹⁴⁾

Der heqé îyaz de di çavkaniyan da gelek rîwayet hen e. Çendek jî wan: Xelîfe kuré Xeyyat gotiye ku îyaz dinavbera Misilmanan de bi fethan hatîye naskirin. Gelé Şamé wî baş nasdike. Cezîraban fetihkiriye.⁽¹⁵⁾ Îbn Sa'd jî dibéje ku: Îyaz însane kî salih u misamehekar bu.⁽¹⁶⁾ Îbn Asakîr jî dibéje ku: Bo fethén erdén Romé (Anadolu) î herî ewil hatîye şandin îyaz e.⁽¹⁷⁾

Der heqé zewaca wî u zarokén wî de, di çavkaniyan da melumat kémin. Îyaz bi keça Ebu Sufyan kuré Herb ra zewîciye. Ji berk u kunya wî Ebu Said e em şén bibejin ku kurek î wî bi navé Saîd he ye.⁽¹⁸⁾

Destpékirina Fethén Cezîraban

Misilmanan wexta ku Şam fetihkirin hézén Bîzansiyen xwe dan nava Anadoluyé. Li rojhilata başur wîlayetén tabié Bîzasiyan hebun. Ji ber vé ye ku mintiqâ Cezîraban bo Misilmanan tehlike erz dikir. Xelkén li vé deré ihtimal bu ku érîşa li ser Misilmanan bikirina. Bi fethé u bi silhê Misilmanan karibuna ev tehlika ji holé rakirina. Ji ber vé ye ku fethén Cezîrî wek dewama fethén Şamé bun. Brokelman divé mijaré de waha dibéjé: "Wexta ku Misilmanan Şam u Babilyon bi dest xwe xistin Cezîraban jî ji xwe wé biketa desté Misilmanan. Askerén Bizansé li wé deré çend cihan de bi cih bubun. Xelké Aramî ji sebaba aqideyén xwe yé monofizist di bin zordariya Bîzansiyen ortodoqsi de mabun. Ji ber vé liser mihafezekirina împaratoriye elaqe raber nedikirin. Bi asran koçberén Erab li vé mintiqé seranser bi cih bubun u Edessa(Ruha) bu fethé hima hima amede bu bu."⁽¹⁹⁾ Li gora fehma Misilmanan jî lazim bu ku navé Xudayé zulcelal bigéhéje Cezîraban u cihén di. Manéén li hember teblixa Îsalâmî divé ji holé

béte rakirin u insanan dînê Xudayé aziz nasbikirina. Li her cephé Misilmanan ji milletanre sé tişt teklif dikirin. Ew teklifan ev bun: Yan wé bubuna Misilman, yan wé li ser dînê xwe mabuna u wé cîzye bidana yan jî wé dinavbera wan u Misilmanan de herb cébuya.

Teyinkirina Îyaz kuré Xenm wek qumandan li Cezîraban

Çavkaniyén me xeber didin ku Îyaz bu ye qomanadana giştî ya Cezîraban. Hatiye qebulkirine ku fatihéCezîraban Îyaz e.⁽²⁰⁾ Wî jî li vé mintéqé çend qumandan teyin kirine.

Îyaz him teve fethén Iraqé him ji én Şamé buye. Ebu Ubeyde kuré Cerrah ew tayne qumandana vé mintiqé kiriye. Îyaz wexta ku Omer kuré Xettab Quds fetihkir ew jî teve Omer hat Qudsé u li bal wî cîh girt. Xence Îyaz çend sahabiyén meşhûrén din jî iştirake vé fethe kirin. Mesela Xalid kuré Welid u Muaz kuré Cebel ji wan e.⁽²¹⁾ Di vé demé de Îyaz li Şamé bu u saleké şun ve Ebu Ubeyde ew şand Cezîraban.

Wexta Îyaz teyine vé deré bu wî jî Suheyl kuré Adî bi qumandanî teyine Reqeýé kir. Ceya a Bîzantiyan a li vé dere alîkarî ji ceyşen li Şamé a Bizansiyen dikir ji ber vî Misilmanan dixwast ku vé tehliké ji holé rakin u Cezîraban bi destxwexin. Misilmanan dixwastin ku bila alîkarî ji vé dere ne gihé Şamé tedbir sitandin u Abdullah kuré Abdullah kuré Atban şandin Nisébînê. Bi vî şeklî her sehabiyek bu qumandané bajarekî.⁽²²⁾ Li gora riwayeta Taberî, Îyaz, Abdullah kuré Abdullah şandiye vé mintéqé u wî jî qeraxa Dicleyé teqib kiriye u gihîştiye Musulé u ji vir jî hatiye Nisébînê. Pişt re bi xelké wé deré re silh çekiriye. Wexta ku ew kirina xwe xeber da Îyaz, Îyaz jî wî tesdiq kiriye.⁽²³⁾ Ji wan xeberan hatiye fehm kirine ku qumandané giştî ya Cezîrabanîyaz kuré Xenm e.

Dîrokvan Xelife kuré Xeyat di dirokaxwe da dibe je ku: Xalid kuré Welid ji teref Ebu Ubeyde hatiye tewzif kirl. Xalid u Ebu Musa hatin bal hev. Wé demé Ebu Musa Ruha u Semset fethkiri bu. Paşé Xalid, Ebu Musa şande Herrané, wî jî Herran fetihkir u xelké wé dere xiste bin cîzyé.⁽²⁴⁾ İhtimale ku ew rîwayeta der heqé demekî ku berî Îyaz were vé mintéqé da ye. Li gora wé jî ew buyeran berî ku Îyaz were vé mintéqé cébune.

Îyaz kingé hate vé mintéqé?

Minaqeşek jî li ser hatina Îyaz di kingé demé de cé buye. Di dîroké de li ser hatina Îyaz yaCezîraban çend rîwayetén cida hene. Belazurî salén 18, 19 u 20 én hicrî dide.⁽²⁵⁾ Waqîdî u Taberî salén 17 é hicrî didin.⁽²⁶⁾ Reqemén Belazurî daye hîn îsabetir xuya dikan. Fethén der u dora Şamé kasî şes sala ajotibu. Van fethan sala 13 é hîcî de destpékîrî bu u di sala 18 é hicrî da xelas bu bu. Li gora van reqeman ceyşen Misilmanan di davîya sala 18 de hatin Cezîraban u di serî sala 19 de Cezîre bi temamî bi destxwe histin. Wexta ku em rîwayetén Belazurî dinérén em şen bibéjin ku fethén Cezîré di sala 18 de destpékér u di sala 19 de qediya. Belazurî di rîwateka din de dide ku Îyaz di sala 19 de hatiya Cezîré.⁽²⁷⁾ Reqema ku Belazurî 20é hicrî daye ihtimaleka dure. Bi piranî çavkaniyén me sala fethan 19yé hicrî dane.⁽²⁸⁾ Ew jî raber dike ku gelekî fethan di sala 19yé da cébune. Mesela fetha Ebu Musa a Nisébînê hatiye riwayet kirine ku di sala 19yé de pék hatiye. Li gora van melumaton em şen bibéjin ku fethén Cezîré sala 19yé de pék hatiye.

Îbnu'l-Esîr, nîşan dide ku fethén İslamiyén di vé demé de çîma ku li pés hev pék hatine buye sebabâ tevliheviya tarîxan. Îhtîmale ku ev fethan we kî me gotiye di sala 18 de destpékiriye u di sala 19 de qediya ye.

Piştî ku Îyaz li vé mintiqé bu qumandan Omer kuré Xetab ji re gelek emrén u yasaxén di herbéda Misilmanan li ber çava bigrin şandiye. Li belé di çavkaniyan de behsa van tiştan ne hatiye kirin.⁽²⁹⁾

Îyaz bi çıqas neferi hate Cezîrabotan?

Em dibînin ku Îyaz bi penc hezar nefer hatiye vé mintiqé. Bo hézén pésî, Meysere kuré Mesruk el-Absî buye serok. Li alî rasté, Saîd kuré Amir buye qumandan. Li aliye çep jî Safwan kuré Muattal bu ye qumandan.

Fetha Ruhayé

Ebu Ubeyde kuré Cerrah piştî ku Îyaz li vé mintiqé teyin kir Îyaz beré hate Ruhayé. Hézén Misilmanan li berxwedane ka mezin ji xelkén wé deré dîtin. Paşé Xelké Ruhayé silh xwest. Li gora vé silhé mebed u mal u can u din u namusén wan dîbin emaneta Misilmanan de hate qebul kirin. Wan vé kenîseyén nu çénekirina. Lewra ku Ruhayîyan liser şert u ahđen xwe nesekînin Misilmanan vé wan himaye nekin. Cihén der doré Ruhayé jî tabéé vé silhé bun.⁽³⁰⁾ Îyaz piştî vé silhé kete Ruhayé u çend rojan li bajér ma. Îyaz ev bajara pir ecibandi bu u bi xelké vî bajarí ra axaftin u mijol çekir, li peyv u gotinén wan guh da u wexta dît ku xelké vé deré ji Misilmanan ditirsine got ku tu zerar u nexweşî ji tu Misilmanî nagihé we u hun netirsin.⁽³¹⁾ Îyaz, tiştén ku gelé Ruhayé ne şé hilde wé ji wan ne hata bixwastin. Wexta wan van peyvanbihîstin kéfa wan jé re hat u keşşé wan behsa fezileta Îyaz kir.⁽³²⁾

Fetha Reqqeyé

Piştî fetha Ruhayé réz hate Reqqeyé. Misilmanan çend éris çekirin u Reqqe bidestxwehistin.⁽³³⁾ Xelké vé deré cotkar bu u li dervayé bajér bi cîhbubun. Wexta Misilmanan ériskirin, xelké xwe avét bajér. Bajar ji teref Misilmanan hate muhaserekirin. Xelké bajér bi tîr u kevran érisce Misilmanan kirin u leşkerén Misilmanan çendek birîndarbun. Misilmanan xwe dan ber deriye Ruhayé u lêzorkirin. Bo hindirkevin liberxwedan. Çîma ku dema hesadé bu xelké fehmikir ku wé liberxwedan zeraré bide wan, dest ji liberxwedané berdan u bi Misilmanara lihevhatin. Seroké hézén xelké Reqqeyé xeberşandîyaz ra u xwast silhé céke. Îyaz eman da wan ku wé mal u can u din u namusé wan dîbin parastina Misilmanan da be. Ji ber ku wé xeracé bidin, Misilmanan erdén wan ji wan re hîştin. Li ser xelké cîzye hate şertkirin. Jin u zarokén wan ji cîzye hate muafkirin. Ew ahd u peymanén ku Misilmanan da ye wan, di çavkaniyén me da bi şeklekî ferehî hatiye rîwayet kirin.⁽³⁴⁾

Li gora rîwayeta Belazurî Îyaz kuré Xenm, Ruha ji xwera kiriye navenda idarı.⁽³⁵⁾ Îyaz Ruha gelek acibandiye u muddetek li véderé maye.⁽³⁶⁾

Fetha Herrané

Piştî fetha Reqqeyé, Îyaz meşîya ser Herrané. Xelké bajaré, xwe parast Herrané u piştî çîşkek li berxwedané bi kevir u tîran érisce Misilmanan kirin u paşé derketin meydané u bi Misilmanan ru bi ru ceng kirin u pir derbas ne bu, li hember

Misilmanan teslîmbun. Silha navbera wan u Misilmanan de hate çékirin wek silha Ruhayé bu.⁽³⁷⁾

Li gora rîwayeté, bi kevrén ji kelaya Herrané hatiye avétin çend neferén Misilmanan şehid ketibun.⁽³⁸⁾ Li ser fetha Herrané Îbn A'sem waha dibéje: "Neferén dijminan di vé cengé de bîst hezar bun. Misilmanan jî pénc hezar bun. Di roja duyemîn a herbé da Misilmanan xwe veşartin u dijminan zankir ku Misilmanan dest ji herbé berdane u çune. Biştî vé menzeré xelké Herrané karé xwe sist kir. Ji ber vé, Misilmanan érîsek bi quwet çékir u serkeftin bi destxwe xist."⁽³⁹⁾ Kaldım???

Fetha Serékaniyé(Resulayn)

Fetha Serékaniyé piştî şerén bi şiddet pék hatiye. Di dawiyé de dijminan silh xwast u navbera her du terefan de silh cé bu. Di vé herbé da hézén dijminan pir tırsiyane ku Umeyr kuré Sa'd ji wan re gotiye, "Netirsin, netirsin berve min werin." Umyer bi vé gotiné eman jî daye wan.⁽⁴⁰⁾ Ev buyera raber dike ku ev herba, bo dijmin gelekî bi zor u zehmet buye u ewan di halekî zorda hiştiye. Piştî silhé erd u derén wan di destwan de maye u ji wan cîzye hatiye standin.⁽⁴¹⁾

Fetha Semseté u der u dora wî

Semset ku îro qezayé bajara Adiyamané ye ji teref Safwan kuré Muattal, ew sahabiyé meşhur, hatiye fetihkirin. Li gora rîwayeté, Safwan u Habib kuré Mesleme bi hevre hatine şandine Adiyamané. Îyaz piştî fetha Herrané çuye Semseté u dît ku her du qumandan ev der fetihkiriye. Li wé deré bi desté Îyaz silh cébu. Wexta piştî vé suhé xelké Semseté liser ehda xwe nesekîniyancareî din Îyaz meşiya li ser wir u cara didiyan ew der histe bin deste wxe u wan kire bin itaaté.⁽⁴²⁾ Li gora xeberdana Xelife b. Xeyyat wé demé Ebu Musa el-Eseri jî li wé deré bu.⁽⁴³⁾

Safwan kuré Muattal bi cihada ku li Semseté kiriye meşhure. Li gora rîwayete kî li vé deré şehid ketiye u ligor rîwayete kî jî heta zemané Muawiye kuré Sufyan jîya ye u li Semseté ji jîyana xwe dest daye.⁽⁴⁴⁾

Fetha Mérdîn u Darayé

Dara li ser réya Mérdînê u Nisébînê ye. Sih kilometreyî dure Mérdînêye. Him Dara u him Mérdîn div ï demî de du bajarén girîngin. Dara bajarekî askerî u Mérdîn jî bajarekî olî bu.⁽⁴⁵⁾

Îyaz piştî ku Ruha, Herran u Semset fetihkir balaxwe da Mérdîn u Darayé. Kela Mérdîn bi dest xwe xist u silh çékir. Şertén ku li bajaran din hatiye qebulkirin li vé deré jî hate qebulkirin u silh hate cih.⁽⁴⁶⁾ Fetha Darayé çîşkekî bi zor u zehmet cébu ye. Çima ku seroké Darayé li hember Misilmanan li berxwe daye u Misilmanan ji bo wî gelek aciz bune u piştî fethé Îyaz li waliyé Darayé daye.⁽⁴⁷⁾

Fetha Nisébînê

Ew bajara girîng a mintiqâ Dîyarérebîa bi çend cara hatiye fetihkirin.⁽⁴⁸⁾ Çavkaniyén me xeberdaye ku ew der ji teref Abdullah kuré Abdullah kuré Etban hatiye fetihkirin.⁽⁴⁹⁾ Abdullah ji Musulé derbase Nisébînê buye u hatiye bi dijmin re silh çékiriye. Şertén silhé wek şertén silha Reqqeyé buye.⁽⁵⁰⁾

Fetha Amedé

Qumandanén mezin wek Xalid kuré Welid îştîrake fetha Amedé kirine. Piştî ku hézén Misilmanan Ruha, Herran, Dara u Mérdîn bi dest xwe xistin bala xwe dan Amedé. Der u doré Amedé bi hésanî bi dest xwe histin u cîzye dan ser xelké Amedé. Li gora rîwayetan navenda bajér bi silhé u der u dorén wî jî bi şer hatiye fetihkirin. Silha vé deré wek silha Ruhayé bu.⁽⁵¹⁾

Di fetha Amedé da Misilmanan menfezek tesbît kirine u ji wir derbasa navenda bajér bune. Di ví karâ de gelek sahabî cihgirtî bun.⁽⁵²⁾

Xelife b. Xeyyat der heqé fetha Amedé de ji kalekî Cezîrî peyvake waha rîwayet kiriye: "Îyaz kuré Xenm li vé mintiqé u li der dora wî, merivé ku cara ewil silh çékiriye ew e. Ji xelké wî ra tiştek nivisand. Ev nivîsa anha jî di destwan da ye u bi navé Îyaz e."⁽⁵³⁾ Li gora vé nivîsé fatihé Cezîrê Îyaz b. Xenm e u çikas jî asr dersbune insanan ew ji bîrnekirine u her tim navé Îyaz anîne ser ziman.

Fetha Xaburé

Îyaz, bo fetha Xaburé Meysere kuré Mesruk el-Absî tewzîfî. Hezar nefer da ber wî u sewqa Xaburé kir. Meysere di réda çend cih fetihkirin u paşé gîhîste Xaburé. Wexta Xabur fetihkir xenîmeté ku bi destxwaxistiye şande Îyaz ra. Paşé jî bi xelké wé deré ra silh çékiriye.⁽⁵⁴⁾

Fetha Musulé

Omer kuré Xetab bo fetha Musulé Îyaz tewzîf kirîbu. Îyaz ev der fetihkir u Utbe kuré Ferqed kire waliyé vé deré. Li gora rîwayeté li vé deré du kela hebun u Ferqed bu ye mesulé idara yeké. Îyaz der u doré Musulé bi herbé u kela wir jî bi silhé fetihkiribu. Fetha vé deré di sala 18 de pékhat.⁽⁵⁵⁾

Xuyakirîye ku bi fethén kasî saleké dewamkiriye Cezîrrobotan bi temamî kete desté Misilmanan u İslâm li vé deré hakim bu. Wek Ruha, Reqqe u Herrané bajaran, yek bi yek hate fetihkirin, xelké Amedé, Meyafarxînê, Sîrûcê, Serékaniyé, Semsaté u Nisébînê bi cizye ve hate girédan. Li gora çavkaniyan bajarén minteqé bi silhé, erdan jî bi herbé hatiye fetihkirin.⁽⁵⁶⁾

Wexta Misilmanan nézîkî kelan bune tekbir anîne u navé Xudayé zulcelal mezinkirine u bi heycan u eşqake mezin ketine van fethan.⁽⁵⁷⁾ Di wexta herban de suraya Enfal u Nuré xandine.⁽⁵⁸⁾ Bi xandina van sureyan Rebbé xwe ji bîr nekirine, di zor u zehmetiya herban de xwe avétine ber kerama Xuda teala.

Sahabiyén ku bi Îyaz re îştîraka fethan kirine

Em dibinin ku hinek sahabîyan bi Îyaz re îştîraka fetha Cezîrrobotan kirine. Hinek ji wan di van fethan de qumandan bun, hinek jî nefer bun. Di vé demé de wexta ku yek li bajare kî qumandan teyîn di bu, di bu waliyé wé deré. Wexta ku Îyaz li vé deré bu, pir kesan li van deran wali teyîn kir u bi desté wan pir bajaran hate fetihkirin. Sahabiyén bi fethé hatine Cezîrrobotan evin:

Xalid kuré Welîd

Wexta fetha diyara Şamé temam bu, Xalid li bal Îyaz îştîraka fethén Cezîrê kir u bi tecribeya xwe ya mezin, ji Misilmana ra bu alîkarekî mezin. Tecriba xwe li vé deré

karxist. Bi taybetî di fetha Amedé de gelekî fedakariya mezin çékir u serkeftineka mezin bi dest Misilmanan xist.

Ebu Musa el-Eşeri

Em zanin ku Ebu Musa li Nisébînê wek qumandan hatiye teyinkirin. Wexta ïyaz bi xelké Ruhayé u Herrané re silh çékir Ebu Musa şande Nisébînê. Wî jî di sala 19 de ev der fetihkir.⁽⁵⁹⁾ Di kitaba Xelîfe b. Xeyyat de li melumete ka waha em rast tén: Ebu Ubeyde, ïyaz kuré Xenm bo fetha Cezîrabotan teyinkir, ïyaz bi Ebu Musa re Herran, Nisébîn u çend cihé din jî fetihkir.⁽⁶⁰⁾ Îbnu'l-Esîr jî qale vé meselé kiriye.⁽⁶¹⁾ Di vé demé de li Nisébînê kelakî gelek girîng hebuye u çar derîyé wé hebune. Di wexta fethé de xelké, xwe avétiye kelé u Misilmanan pir meşxulkirine.⁽⁶²⁾

Huzeyfe kuré Yeman el-Absî

Vî sahabiyé meşhur îştîraka herba Yermuké u fetha Dimeşqé kiriye u mizgîniya fethé gîhîştandiye Omer kuré Xetab. Teve fethén Cezîrabotan buye u çîşkek li Nisébînê iqamet kiriye. Paşé ji Dîyara Şamé veqetiya u teve fethén Iraqé bu.⁽⁶³⁾

Hîşam kuré Hakim

Teve fethé Darayé buye.⁽⁶⁴⁾ Îhtîmale ku teve fethén mintiqeyén din jî buye u di bin emré ïyaz de hereket kiriye.

Habib kuré Mesleme

Xelife Omer, Habib kuré Mesleme şand Cezîrabotan ya derén ku xelké wî ne Misilman bun.⁽⁶⁵⁾ Li gora vé melumaté li Cezîrabotan him xelkén Arap him jî én ne Arab hebun. Evan hinek Suryan,⁽⁶⁶⁾ hinek Kurd⁽⁶⁷⁾ u hinek jî Ermen bun. Ermen u Suryan Nesara bun.⁽⁶⁸⁾

Safwan kuré Muattal

Ji Misilmanén ewil bu u li cem Péxember (s.) tevî xezweyan bubu u di wexta fethén Şamé de hatiye vé mintiqé u pişt re hatiye Cezîrabotan u tevî fethén vé deré buye. Di sala 19 de li rojavaya Ruhayé li Semseté⁽⁶⁹⁾ji jîyana xwe destdaye u li vé deré definkirine.⁽⁷⁰⁾ Li gora rîwayete ké jî Safwan li Semseté bi cih buye u hetta dema xilafeta Muawîye kuré Ebu Sufyan jîyana wxe domnadiye u li vé deré wefatkiriye.⁽⁷¹⁾

Muawîye kuré Ebu Sufyan

Muawiye bi piranî di fethén Şamé de meşhur buye. Pişîfethan li Şamé walîtî kiriye u gelek nacih buye. Li gora rîwayeteké Muawîye, Habîb kuré Mesleme u Safwan kuré Muattal tev hatine Semsaté u ceng kirine.⁽⁷²⁾

Abdullah kuré Abdullah kuré Atban

Abdullah jî li Cezîrabotan di fetha da xebitiye u qumandanî kiriye.⁽⁷³⁾ Li gora çavkaniyan bi emre xelîfe Omer u bi şandina Sa'd kuré Weqqas hatiye vé mintiqé.⁽⁷⁴⁾ Nisébîn beré bi desté Ebu Musa El-Eşerî hatibu fetihkirin. Îhtîmale ku pişt re xelké vé deré silha xwe etilandin u Misilmanan cardin meşîyan ser wan u fetha duyemîn cébu u ew fetha jî bi desté Abdullah kuré Abdullah kuré Atban pékhât u Abdullah bi wan re silh nu kiribu. Silha vé deré bubu wek silha Reqqeyé.⁽⁷⁵⁾

Suheyl kuré Adî u Tehdîdkirina Xelké Cezîrabotan

Berî ku fethén Cezîrabotan destpêke Suheyl kuré Amir li kéléka ava Feraté rawesta u ji gelé wî mintiqé ra wanî got: "Hun di navbera wan herdu gelan da ne (Ev gelan gelé mintiqâ Şam u Iraqé ye). Anha em bi wanre cengé dikin. Wexta ku işe me bi wan re qediya wé dor were we." Îhtîmale ku ew tehdîda xelk tırsand u ewan dest bi xwastina silhé kirin.⁽⁷⁶⁾ Di vé demé de ceyşen Misilmanan bubun di perçe. Yek li mintiqâ Şamé bi Bîzansiyen re u é di jî bi Sasanîyan re herb dikir. Cepha sémeyemîn tune bu. Misilmanan ne dixwast cepha sémeyemîn vequin. Piştî fetha Şamé temam bu, Misilmanan beré xwe dan Cezîrabotan u hatin qasî saleké de ew der fetihkirin. Di vé demé hézén Misilmanan én ku li Şamé u li Iraqé herb dikirin. Car car li van mintiqan Misilmanan di ketin zor u zehmetiyé u hézén xwe dikirin di cihan u ji Medînê alîkarî dixwastin. Li mintiqé Şamé Misilmanan caran diketin zorîyé u çima ku dijminan li ser ahd u peymana wxe nedisekînin cara duyemîn Misilmanan ceyş dişand li ser wan u car din fetih cé dibu. Mesela Ruha, Semset u çen derén din, du caran fetih bubu.⁽⁷⁷⁾

Suheyl bi vé tehdîde xelké Cezîrabotan men kir ku bila alîkariyé nedin hézén Bîzansiyen. Nîyeta Suheyl ev bu. Wexta xelké Cezîré bihîst ku hézeka Misilmanan ji Iraqé bo alîkariyé bide Misilmanen ku li Şamé ne, destdayîna alîkarîya bo Bîzansiyen kişand u ji bajarén xwe veneqetiyan u Romîyan tené hiştén.⁽⁷⁸⁾ Vé demé de Xalid kuré Welîd bi héza xwe bo alîkariyé bi de hézén Misilmanan ya li Şamé, ji Iraqé hatî bu Şamé.

Sahabî Busr kuré Ertat u minaqeşaya navbera wi u Îyaz da

Piştî ku Ruha u Reqqe fetih bu, der heqé xenîmeté da navbera Busr kuré Ertat u Îyaz de minaqeşê derket. Busr bi hezar neferî hatî bu Cezîrabotan. Wexta Busr gîhişte Ceziré ji Îyaz ra got ku "Em jî xwedîpayé xenîmeté ne." Lé beléyaz xenîmet belavkiribu. Ji Busr ra got ku "Heqé we di vî xenîmetî de tu ne ye u piştî fethén ji vir u wa xenîmet heqé we ye." Busr ev qebul nekir u mesele ji Yezîd kuré Ebu Sufyan re got. Axirî mesele gîhişte xelîfe Omer. Omer jî ji Yezîd re xeber şand ku bila Îyazre, ji bo kîrinén xwe, zor u zehmetî lé ne be, bila dibin zordarîyé de nemine. Ew di nav Misilmanan de mirovekî gelek qiymetgiran u xwedîyé îhtîrame.⁽⁷⁹⁾ Paşé Omer, ji Îyaz re nameyek nivisi. Ji wî re got ku: "Min hézén alîkariyé, bo tırsé bixîne nav dijminan u wan bixe bin itaaté şandiye. Min fehm nekir ku te, héza min ji tere şandiye te vegerandiye." Îyaz di name ya xwe da bersîv da ku, heqé wan di xenîmeta Ruhayé u Reqqeyé da tu ne ye. Ji vir u wa ku fetih bibin heqé wan îcar wé xenîmet jî bibe heqé wan. Vegerandina wî jî ji bo ku navbera me de ïnadî cé ne be bu. Şayet ku ïnadî cé bibe wé ew bibe sebaba xerabiya navbera leşkeren de." Îyaz mesele bi vî şekî izzahkir u got ku "Min bi xwe ji Busr ra mezeret beyankiriye u pişt re ew şandiye." Omer bersîva Îyaz rast dît u ji wî ra dua kir. Jé re got ku "Heta ku ez li vé heyaté bim, té vé wezîfî bidomimî u ezé ji xelîfeyé ku du min re were, ezé te tawsîye bikim u té cihada xwe bidominî."⁽⁸⁰⁾ Wexta Îyaz name ya Omer bidest xwe xist ji Xudé ra hemd u sena kir u pişt re jî temenni kir ku, du Omer ra rojek be jî naxwaze bijî.⁽⁸¹⁾

Dawî

Îyazdinav sehebiyan de bi fetha mintiqâ Cezîrrobotan hatiye naskirin. Li vé mintiqé Ruha u der u dora wî fetihkiriye u gelek serkeftin bi dest xwe xistine. Di qasî saleké de pir bajar fetihkirine. Wî ji sehebiyan gelek qumandan teyîn kirine u ew qumandanen jî wek wî serkeftine. Qumandanen di bin emré wi de şixulîne, gelekî merivén meşhurén. Ewan Xalid kuré Welid, Ebu Musa el-Eşerî u Huzeyfe kuré Yeman e.

Heyata Îyaz gelek bi besatet u sade bu. Xelife Omer walî u qumandanen xwe gelekî qontrol dikir. Car car Îyaz qontrol kiriye u ceza jî daye wî.

Îyaz pir cih fetih kirin u jiyanâ wî bi cihada di réya Xuda da derbas bu. Qumandaniya wî bi gelek serkeftinan derbas bu.

Di qasî saleké de Cezîrrobotan bi temamî ji teref Misilmanan hate fetih kirin. Hinek cih bi zehmetî hate fetihkirin nihek jî bi hésanî. Ruha, Amed, Mérdîn u der u dora Ferat u Dicleyé hate fetih kirin u Misilmanan hédî hédî li van deran bi cih bun. Misilmanan bune fermandaré Cezîrrobotan.

Xelké Cezîrrobotan tabéé împaratoriya Bîzansî bu. Wan alîkarî didan dewleta Bîzansî. Ji ber vé ye ku Misilmanan dixwast ew der fetihkirana. Pir derbas nebu, deme kî kin da Cezîrrobotan kete dest Misilmanan u sînoradewleta İslâmî mezinbu.

Çavkaniyan:

1. Abdulgani Efendi, el-Cezire'nin Muhtasar Tarîxi, weşan: Mustafa Öztürk-İbrahim Yılmazçelik, Elazığ: Weşanén Çapxana Ferat, 2004, p.13.
2. Arif, el-Arif, el-Mufassal fi tarhi'l-Kudus, Beirut: el-Muessesetü'l-Arabiyye 2005.
3. Belâzûrî, Ahmed b. Yahya b. Cabir, Futûhu'l-buldan, neşr: Beirut: Dâru'l-Kutubi'l-İlmiyye 2000, tercuma zimané Tirkî. Prof. Dr. Mustafa Fayda, Ankara: Kültür Bakanlığı Yayınları 2002.
4. Bozkurt, Abdulkâî, el-Cezire Fatîhi Îyaz bin Şanem ve Mardin'in İslamlaması, Danışman: Hasan Bahar, (teza lisansa bilind) Selçuk Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Konya 2006.
5. Carl Brokelmann, İslâm Ulusları ve Devletleri Tarîhi, tercuma zimané Tirkî: Neşet Çağatay, Ankara: Muessesa Tarîxa Tırka, 2002.
6. Çubukçu, "Îyaz b. Ganm", MEWSUA İslâmî YA DîYANETÉ, XXIII, 498.
7. Halebî, Muhammed Ragîb b. Mahmud et-Tabbâx (1951), Îlâmü'n-nubelâ bî Tarîxi Halebî's-şehbâ, Halep: el-Matbaatu'l-İlmiyye 1923.
8. Hesen Şumeysanî, Medinetu Mardîn minel Fethî'l- Arabî ila sene 1515, Âlemü'l-Kutub, Beirut, 1987.
9. Îbn A'sem el-Kûfî, Fûtûh, nr. Suheyl Zekkâr, Beirut: Daru'l-Fîkr 1992.
10. Îbn Asâkir, Ebu'l-Kasim Ali b. Hasan (571/1170), Tarîxu medînetî Dîmaşk, I-LXXX, nr. Muhibbuddin Ebû Saîd Ömer b. Garame el-Amravî, Beirut: Daru'l-Fîkr 1995-1998.
11. Îbn Hacer, Şîhabuddin Ebu'l-Fazl Ahmed b. Ali el-Askalânî (852/1448), el-Îsabe fi temyizi's-sahâbe, Lübnan, Beytu'l-Efkari'd-Devliyye, 2004.
12. Îbn Kesir, İsmail b. Ömer, (774/1372), e-Bîdâye ve'n-nîhâye, I-XX, Beirut: Daru Hicr, 1997.
13. Îbn Sa'd, Muhammed (230/844), et-Tabakâtü'l-kubrâ, nr. İhsan Abbas, Beirut: 1968.
14. Îbnü'l-Cevzî, Cemaluddîn Ebu'l-Ferec, (579/1201) Sifâtu's-safwe, nr. Mahmud Fahûrî, Beirut: Daru'l-Maarif 1979.
15. Îbnü'l-Esir, İzzüddin (630/1236), el-Kâmî fi't-tarîx, nr. C. J. Tonberg, Beirut: 1979.
16., Usdu'l-xâbe fi ma'rîfetî's-sahâbe, y.y. 1970.

17. Îbnü'l-îmad, Şihabuddin Ebu'l-Felah Abdurrahman b. Ahmed (1679), Şezerâtü'z-zeheb fi ahbarî men zeheb, weşan: Abdulkadir el-Arnâût-Mahmûd el-Arnâût, Beyrut: Daru Îbn Kesir 1986, I, 172;
18. İsmail Yiğit, "Kuruluşundan Mervaniler Dönemine Kadar Cizre" Hz. Nuh'tan Günümüze Cizre Sempozyumu, İstanbul 1999, amedakar: M. Said Özelvarlı, p. 56.
19. Karan, Cuma, Diyâr-i Bekir ve Müslümanlarca Fethi, Weşanxana Ensar, İstanbul 2010.
20. Lazarev M.P. ve dğr. Kürdistan Tarihi, ji zimané Rusî tercume: İbrahim Kale, Weşanén Awesta, 2001, p. 30.
21. Nekûlâ Ziyade, "et-Tatawuru'l-îdârî li Bîlâdi's-Şâm beyne Bîzanta we'l-Arab", el-Mü'temerû'd-duwelî er-Râbi' li Tarîxi bilâdi's-Şâm, 15-19 Aralık 1985, Editör: Muhammed Adnan Bahît, Muhammed Asfûr, Amman 1986.
22. Nevehî, Ebû Zekeriyya Muhyiddin b. Şeref (676/1277), Tehzibu'l-esmâ ve'l-lugât, Beyrut.
23. Şeşen, Ramazan, "Cezire", MEWSUA İSLAMÎ YA DÎYANETÉ, VII, 509-11.
24., Urfa Bölgesi Tarîxi, İstanbul 1960.
25. Taberî, Cerîr b. Muhammed, Tarîxu Taberî, Daru'l-Efkar ed-Devliyye, Ürdün 2004.
26. Vâkidî, Ebû Abdullah Muhammed b. Omer (207/823), Tarîxu Futuhi'l-Cezîre ve'l-Habûr ve Diyâr-i Bekir ve'l-Irak, nşr: Abdulaziz Feyyaz Xarfûş, Dîmaşk: Daru'l-Beşâîr 1996, p. 8.
27. Xelîfe b. Xeyyat, Tarîx, tehqiq: Suheyl Zekkar, Beyrut, Daru'l-Fîkr 1993.
28. Ya'qûbî, Ahmed b. Ebû Ya'qûb b. Ca'fer b. Vehb b. Vâdih (284/897), Tarîx, Beyrut.
29. Yakup Tahincioğlu, Süryaniler, Weşanén Butik, İstanbul 2011.
30. Yaqut el-Hamevî, (626/1229), Mu'cemü'l-buldan, weşan: Ferid Abdulaziz el-Cündî, Beyrut, bê Tarîx, II, 134.
31. Zehebî, Şemsuddîn Muhammed b. Ahmed b. Osman (748/1347), Siyeru a'lâmi'n-nubelâ, Beyrut, Beytu'l-Efkâri'd-Devliyye: 2004.
32., Tarixu'l-İslâm we wefeyâtu'l-meşâhir ve'l-a'lâm, I-XL, weşan: Omer Abdusselam Tedmurî, Beyrut: Daru Îbn Kesîr 1997.

Perawêz

- (1) Yaqut el-Hamevî, (626/1229), Mu'cemü'l-buldan, nşr. Ferid Abdulaziz el-Cündî, Beyrut, bê Tarîx, II, 134.
- (2) İsmail Yiğit, "Kuruluşundan Mervaniler Dönemine Kadar Cizre" Hz. Nuh'tan Günümüze Cizre Sempozyumu, İstanbul 1999, amedakar: M. Said Özelvarlı, p. 56.
- (3) Yaqut, II, 134.
- (4) Binér: Ramazan Şeşen, "Cezire", MEWSUA İSLAMÎ YA DÎYANETÉ, VII, 509-11; Şeşen, Urfa Bölgesi Tarîxi, İstanbul 1960, p. 98.
- (5) Nekûlâ Ziyade, "et-Tatavvuru'l-îdârî li Bilâdi's-Şâm beyne Bizanta ve'l-Arab", el-Mü'temerû'd-düvelî er-Râbi' li Tarîxi bilâdi's-Şâm, 15-19 Aralık 1985, Editör: Muhammed Adnan Bahît, Muhammed Asfûr, Amman 1986, p. 126.
- (6) Sure ya Rum 30/2-5.
- (7) Îbn Asakîr, Tarîx, XLVII, 254.
- (8) Îbn Hecer, el-Isâbe, p. 1028 (2004).
- (9) Îbn Hecer, el-Isâbe, p. 1028 (2004)
- (10) Îbn Asakîr, Tarîx, XLVII, 279.
- (11) Îbn Sa'd, et-Tabakât, VII, 398; Îbn Asakîr, Tarîx, XLVII, 264; Zehebî, A'lamu, II, 354; Îbnü'l-Cevzî, Cemaluddîn Ebu'l-Ferec, (579/1201) Sifâtu's-safve, nşr. Mahmud Fahûrî, Beyrut: Daru'l-Maarif 1979, I, 669; Îbnü'l-îmad, Şihabuddin Ebu'l-Felah Abdurrahman

- b. Ahmed (1679), *Şezerâtü'z-zeheb fi ahbari men zeheb*, nşr. Abdulkadir el-Arnâût-Mahmûd el-Arnâût, Beirut: Daru Îbn Kesir 1986, I, 172; Nenevî, Ebû Zekerîyya Muhyiddin b. Şeref (676/1277), *Tehzibu'l-esmâ ve'l-lugât*, Beirut trz., II, 43; Halebî, Muhammed Ragib b. Mahmud et-Tabbâx (1951), *İ'lâmü'n-nubelâ bi Tarîxi Halebi's-şehbâ*, Halep: el-Matbaatu'l-İlmiyye 1923, I, 10. Binér: Çubukçu, "İyaz b. Ganm", MEWSUA İSLAMİ YA DİYANETÉ, XXIII, 498.
- (12) Îbn Asakîr, *Tarîx*, XLVII, 267.
 - (13) Îbn Asakîr, *Tarîx*, XLVII, 267.
 - (14) Îbn Asakîr, *Tarîx*, XLVII, 272.
 - (15) Îbn Asakîr, *Tarîx*, XLVII, 267.
 - (16) Îbn Sa'd, *Tabakat*, V, 95.
 - (17) Îbn Asakîr, *Tarîx*, XLVII, 278.
 - (18) Îbn Asakîr, *Tarîx*, XXXI, 4; LXX, 218-22; *Usdu'l-xâbe*, III, 308; *el-İsâbe*, IV, 150; VIII, 378.
 - (19) Carl Brokelmann, *İslâm Ulusları ve Devletleri Tarîxi*, tercuma zimané Tirkî: Neşet Çağatay, Ankara: Merkeza Tarîxa Tırka, 2002, p.45.
 - (20) Belâzurî, *Futuh*, p. 107.
 - (21) Arif el-Arif, *el-Mufassal fi Tarîxî'l-Kudus*, p. 172.
 - (22) Taberî, *Tarîx*, p. 652 (2004).
 - (23) Taberî, *Tarîx*, p. 653 (2004).
 - (24) Xalife b. Xayyât, *Tarîx*, p. 77.
 - (25) Belâzurî, *Futuh*, p.114.
 - (26) Ya'qûbî, Ahmed b. Ebû Ya'qûb b. Ca'fer b. Vehb b. Vâdîh (284/897), *Tarîx*, Beirut , II, 150; Belâzurî, *Futuh*, 108; Taberî, IV, 233; Zehebî, *Tarîx* (Yıl: Hicrî 11-40) p. 186; Abdulgani Efendi, *el-Cezire'nin Muhtasar Tarîxi*, weşan: Mustafa Öztürk-İbrahim Yılmazçelik, Elazığ: Weşanén Çapxana Ferat, 2004, p.13.
 - (27) Îbn Asakîr, *Tarîx*, XLVII, 277. Biér, Karan, Diyâr-ı Bekir ve Müslümanlarca Fethi, Weşanxana Ensar, p. 200.
 - (28) Taberî, *Tarîx*, p. 652 (2004).
 - (29) Îbn Asakîr, *Tarîx*, XLVII, 280.
 - (30) Ya'kûbî, *Tarîx*, II, 150; Belâzurî, *Futuh*, 108; Taberî, IV, 233; Zehebî, *Tarîx* (Yıl: Hicrî 11-40) p. 186; Abdulgani Efendi, *el-Cezire'nin Muhtasar Tarîxi*, p.13.
 - (31) Îbn A'sem, *Futuh*, I, 252.
 - (32) Îbn A'sem, *Futuh*, I, 253.
 - (33) Îbn A'sem, *Futuh*, I, 249.
 - (34) Belâzurî, *Futuh*, p. 109.
 - (35) Belâzurî, *Futuh*, p. 109.
 - (36) Îbn A'sem, *Futuh*, I, 252.
 - (37) Belâzurî, *Futuh*, p. 110; Îbn Asakîr, *Tarîx*, XLVII, 277-8.
 - (38) Îbn A'sem, *Futuh*, I, 256.
 - (39) Îbn A'sem, *Futuh*, I, 257.
 - (40) Belâzurî, *Futuh*, p. 110.
 - (41) Belâzurî, *Futuh*, p. 110.
 - (42) Belâzurî, *Futuh*, p. 109-110.
 - (43) Xelîfe b. Xeyyat, *Tarîx*, p. 77.
 - (44) Belâzurî, *Futuh*, p. 114.
 - (45) Hesen Şumeysanî, *Medinetu Mardîn minel Fethî'l- Arabî ìla sene 1515*, Âlemu'l-Kutub, Beirut, 1987, p. 45.

- (46) Belâzurî, *Futuh*, p. 110;
- (47) Îbn Asakîr, *Tarîx*, XLVII, 267.
- (48) Yakût, *Mu'cem*, II, 134.
- (49) Îbn Hecer, *el-Îsâbe*, 800 (2004).
- (50) Taberî, *Tarîx*, p. 653 (2004).
- (51) Xalife b. Xeyyat, *Tarîx*, p. 77. Belâzurî, *Futuh*, p. 110.
- (52) Binér, Karan, *Diyâr-ı Bekir ve Müslümanlarca Fethi*, p. 147.
- (53) Xelîfe b. Xeyyat, *Tarîx*, p. 77.
- (54) Îbn A'sem, *Futuh*, I, 257.
- (55) Xelîfe b. Xeyyat, *Tarîx*, p. 77.
- (56) Belâzurî, *Futuh*, p. 111. Ayrıca bk. Xelîfe b. Xeyyat, *Tarîx*, p. 77; Vâkidî, Ebû Abdullah Muhammed b. Omer (207/823), *Tarîxu Futuhî'l-Cezîre ve'l-Habûr ve Diyâr-ı Bekir ve'l-Irak*, nşr: Abdulaziz Feyyaz Xarfûş, Dîmaşk: Daru'l-Beşâîr 1996, p. 8.
- (57) Belâzurî, *Futuh*, p. 84; Îbn A'sem, *Futuh*, I, 251; Îbnü'l-Esîr, *el-Kâmîl*, II, 491-2.
- (58) Taberî, IV, 59. Îbn Kesîr, *el-Bîdâye*, IX, 555.
- (59) Taberî, *Tarîx*, p. 652 (2004).
- (60) Xelîfe b. Xeyyat, *Tarîx*, p. 77.
- (61) Îbnü'l-Esîr, *el-Kâmîl*, II, 492.
- (62) Îbn A'sem, *Futuh*, I, 258.
- (63) Bk. Ya'kûbî, *Tarîx*, II, 141; Îbn Asakîr, *Tarîx*, XII, 259, 300; Nevevî, *Tehzibü'l- esmâ*, I, 153.
- (64) Îbn Asakîr, *Tarîx*, XLVII, 267.
- (65) Taberî, *Tarîx*, p. 653 (2004), Îbnü'l-Esir, *el-Kâmîl*, II, p. 492.
- (66) Bozkurt, İyaz, p. 56. Yakup Tahincioğlu, Süryaniler, Weşanén Butik , İstanbul 2011, p. 181.
- (67) Lazarev M.P. ve dğr. Kürdistan Tarihi, ji zimané Rusî tercüme: İbrahim Kale, Weşanén Awesta, 2001, p. 30.
- (68) Bozkurt, İyaz, p. 58.
- (69) Îro ev der qezayé bajaré Adiyamané ye.
- (70) Îbn Asakîr, *Tarîx*, XXIV, 158-176. Îbn Kesir, *el-Bîdaye*, I. 1071 (2004).
- (71) Belâzurî, *Futuh*, p. 114.
- (72) Belâzurî, *Futuh*, p. 114.
- (73) Taberî, *Tarîx*, p. 653 (2004).
- (74) Îbn Hecer, *el-Îsâbe*, 800 (2004).
- (75) Taberî, *Tarîx*, p. 653 (2004).
- (76) Taberî, *Tarîx*, p. 653 (2004); Karan, *Diyâr-ı Bekir ve Müslümanlarca Fethi*, p. 122.
- (77) Belâzurî, *Futuh*, p. 109-110.
- (78) Taberî, *Tarîx*, p. 652 (2004).
- (79) Îbn A'sem, *Futuh*, I, 254.
- (80) Îbn A'sem, *Futuh*, I, 255.
- (81) Îbn A'sem, *Futuh*, I, 255.

الفتح الاسلامي للجزيرة

الملخص:

بعد وفاة رسول (ص) الخليفة الأولى أبو بكر بدأ بالعملية الفتح الاسلامي. جهز الجيشين وأرسل واحداً منهما إلى بلاد الشام والآخر إلى العراق. بعدما فتح المسلمون بلاد الشام اتجهوا إلى الجزيرة الفراتية. بعد وفاة أبي بكر، عمر ابن الخطاب صار خليفة واتسمر في الفتوحات وتوسيع فيها. الخليفة عمر عين عياض بن غنم قائداً للجيش في الجزيرة الفراتية. عياض أتى إلى المنطقة بخمسة آلاف نفر. في هذا الوقت الجزيرة كانت تحت الحكم البطاطسي. عندما تم فتح بلاد الشام اتجه الجيش الإسلامي إلى الذين ساندوا مع البطاطسي في الفتوحات الشامية. أناس الجوزية وقفوا في وجه المسلمين بعشرين ألف جندياً وقعت بين المسلمين وأناس الجوزية حروب عظيمة. أول المدينة التي فتحت في المنطقة صار رها وبالتالي فتحت آمد ونصيبين وسرد وماردين ونواحي هذه المدن. عياض قضى عاماً في هذه المنطقة. سيطروا المسلمون على جميع أنحاء الجزيرة الفراتية في سنة واحدة بعد اتمام الفتوحات. أتوا بعض الصحابة إلى المنطقة وسكنوا فيها. في بحثنا هذا سنركز على الفتوحات الإسلامية في الجزيرة الفراتية.

الكلمات الدالة: الجزيرة، الفتح، الإسلام، عياض، رها.

Conquest of the Jazeera by Muslims in 18/640

Abstract:

After the death of the Prophet Mohammad, first Caliph Abo Bakr started the Islamic conquests. He prepared two armies and sent them in two directions. He sent one to the Damascus and the other to Iraq. When Muslims conquered the Damascus, they turned Jazeere. After the death of the Caliph Abo Bakr, Omar became the caliph and he continued the Islamic conquests. The great places were conquered by muslims armies in this time. Caliph Omar appointed Iyaz b. Ganm as a commander in Jazeera. Iyaz came to Jazeera with the army of five thousand people. At that time Jazeera was under Byzantine rule. After Muslims conquered Jazeera, they turned to those who helped Byzantium in the wars happened in this area. People of Jazeera

with twenty thousand people opposed Muslims. In Jazeera difficult battles took place. Edessa(Urfa) was the first conquered place in Jazeera. After the conquest of Edessa, Diyarbakır, Nisibis and Mardin, surrounding places were conquered. Iyaz stayed in Edessa for about a year. Jazeera in one year came under the rule of Muslims. After the conquests very companions of Prophet Mohammad came to cities of Jazeera and they settled there. In this study will be described the history of Islamic conquest of Jazeera in 18/640.

Keywords: *Jazeera, Conquest, Islam, Iyaz, Ruha.*